



Avrupa Türkiyeli İşçiler Konfederasyonu
Konfederasyona Karker ên ji Tirkîye li Ewropa
Konföderation der Arbeiter aus der Türkei in Europa
Confederation Workers from Turkey in Europe
La Confédération des Travailleurs de Turquie en Europe
Confederatie van Arbeiders uit Turkije in Europa

www.atik-online.net

[konsey@atik-online.net](mailto:konsej@atik-online.net), info@atik-online.net

13 Mart 2010

NEWROZ PÎROZ BE!

Tu bi xêr hatî **Newroz**, tu bi xêr hatî roja ku taca serfiraziyê dide ser berxwedanê! Tu bir xêr hatî **Newroz**, roja ku berxwedan dibe çejn bi dilanên ku li dora agirên ser çiyayên tên girtin! Tu bi xêr hatî **Newroz**, roja ku îro neteweyê Kurd û gelên Rojhilata Navîn jê sûd werdigirin û serhildanên xwe gêştir dikin! Tu bi xêr hatî roja berxwedanê û serfirazî!

Ligel ku **Newroz** tê wateya roja nûhû û ku gelên Rojhilata Navîn vê rojê weke mizginiya biharê pîroz dikin, ji bo Kurdan wateyekê vê rojê kûr û dîrokî heye. Ji bo Kurdan Newroz roja serhildan, berxwedan, û biserketin e. Ji Kawayê Hesinker heta Komara Mahabat'ê, ji serhildana Dêrsim'ê heta serhildana Îroyîn, Neteweyê Kurd ji aliyê dewletên herêmê ve hatiye bindestkirin, çewisandin, qirkirin, û înkarkirin. Ligel wan hemû hewldanên tinekirinê, neteweyê Kurd berxwedana xwe berdewam kiriye û Newroz'ê kiriye sembola serfirazî û wê bi coşekê her gêştir dibe pîroz dike.

Dewleta Tirkîye, ku hebûna wê ji demên Osmanîyan heta komarê gihêştîye îro, bi taybetmendiyên xwe yê zalîm û zordar, ti carekê ji polîtîkayên xwe yê çewisandin û tinekirina Kurdan dest nekişandiye. Ew polîtîka îro jî bi heman awayê lê bi navê "vebûn"ê berdewam e. Li gor dîrektîfên DYA û YA, hikûmata AKP bi navê paketa "vebûna demokratîk"ê ve û bi dirûşîma çareserkirina pîrsgirêk a Kurd ve bi rê ket. Di encamê de DTP hat girtin û bi sedan endamên û rêveberên wê hatin xistin girtîgehê. Heman gavên zilmê li hemberî BTP'yê jî tên şopandin. Paketa ku bi pejirandina hebûna neteweyê Kurd û radestkirina mafên çandî ve hat vekirin di demekê kin de wergerî polîtîkayê zilm û zordariyê. Navê wê "vebûn" jî be, hê jî helwesta rejîm a Tirkîye ya berbi neteweyê Kurd li ser bingeha înkâr, pişaftin, û tinekirinê disekine. Diyar e ku armanca "vebûn"ê jîholêrakirina tevgera neteweyî ya Kurd e, hem ji nava Tirkîye'yê û hem jî ji nava Rojhilata Navîn'ê.

Bi piştgiriya emperyalîstên DYA, dewleta Tirkîye hewl dide ku derdora tevger a neteweyîya Kurd bipêçe, wê bêçalak bike, û berxwedana sazdar a neteweyê Kurd bişikîne. Weke parçeyekê vê hewldanê, Tirkîye bi dewletên Îran, Sûriye, û Iraq'ê re peymanan çêdike û operasyonên xwe yê li dijî tevgera neteweyî ya Kurd her berfirehtir dike. Herwiha, emperyalîstên Ewropî jî destên alîkariyê didin dewleta Tirkîye. Li gelek bajarên Ewropa'yê, bi ser ciyên Kurd de hatin girtin û gelek kesên Kurd hatin binçavkirin. Bûyerên wusa yê herî dawîn li Belçîka'yê bihûrîn. Li roja 4 Avdar'a 2010'an, di serê sibê de, hêzên çêkdarên dewleta Belçîka êrîş anin 25 ciyên têvel ên Kurdan, ku ROJ TV jî têde bû. Di encamê de gelek cîhazên ROJ TV hatin xira kirin û gelek kes hatin binçavkirin. KONGRA-GEL jî yek ji ciyên biserdegirtî bû û li wê derê jî hêzên fermî yê Belçîka dest da ser gelek belgeyên saziyê û gelek siyasatmedarên Kurd binçav kirin. Di nav kesên girtî de siyasemedarên Kurd ên wek Zûbeyîr Ayda, Adnan Uzun, û Remzî Kartal jî hebûn.

ATIK (Konfederasyona Karker ên ji Tirkîye li Ewropa) dide zanîn: Ku em ê bêdeng memînin li hemberî hewlên tinekirin ên li dijî neteweyê Kurd û ku li her derê ku em lê ne em ê bi gelê Kurd re li meydana bibin. Em bîryara dewlet a Belçîka ya girtina ROJ TV'yê, û êrîşên wê yê li dijî weşana azad a Kurdistan'ê û saziyên demokratîk ên Kurdan şermazer dikin. Em ji bo ji nû ve vekirina ROJ TV'yê bîryariya xwe ya berdewamkirina piştevanî û têkoşîna xwe didin bihîstin û çejna Newroz a neteweyê Kurd pîroz dikin.

ÇEJNA NEWROZ A NETEWYÊ KURD PÎROZ BE!

BIJÎ NEWROZ, ROJA SERHILDANA NETEWE YÊ KURD!